sipasîya xwe pêşkeşî we dikim.
Hevalno ez hêvîdarim di demek nêzî re babet û mijara ku ji min hatîye xwestin binwîsim û ji we re bişînim... lê bawerim eger hun pirsên xwe bişînin û ez bersiv bidim baştir dibe...
Bi hêvîya rojekî ku gelê me mafê jîyana azad bigre destê xwe û tu kes di girtîgehan de nemîn in.
Azadî mafê mirovan e!.
Serkeftin ji we re û ji xebatkarên kurd li her 4 alîyên welat!.

Birayê we yê biçûk ; şêrko Cîhanî – bajara Mehabad 16 . 2 . 2007

H e v p e y v î n bi Ç a l a k v a n ê k u r d ŞÊRKO CÎHANÎ re

_ Kak Şêrko tu gelekî bi xêr hatî…

* gelek sipasiya we dıkim û silawê xwe ji NEWROZ û xwendwanên hêja re dişînim...

_ Ji kerema xwe re, tu xwe bi xwendevanên NEWROZê bidî naskirin?.

* Ez Şêrko CÎHANÎ xelkê bajara Mehabad, li sala 1977 hatime dinê û qasî 12 sale ku bi karê çîrokniwîsîn û helbest, herweha henek jî fîlman re mijul im. Ez endama sazîya rêxistina mafê Mirovan a rojhilatê Kurdistan RMMK û herweha di wan demên dawîyê de jî, ji ber xebatên endam3en hêja yên sazîya PEN, ez bun endama PENa kurd jî

_ Em agedar in ku bavê te, di sala 1982 an de, li Tehranê, li ser destê rijîma komara Islamî ya Îranê ji bo kurdayetiyê hatiye şehîd kirin. Gelo ew bi çi tewanê hatibû gunehbar kirin?.

* raste. Bavê min " Elî CÎHANÎ " tevî 2 hevalên xwe re bi tawana ku bombeyek li nimêja înê ya Tehranê bi xwestek û armanca kuştina hejmarek pasdar û mella yên wek " Xameneyî " din aw mafûreyek de bi cêh kir bûn, û piştî teqîna bombeyê û kuştina hejmarek pasdar hatibûn girtin. Girtina wan çend roj paşê pêk hat. Wê gavê ez zarok bûm. Îdam kirina bavê min bû sebeb kû ez zêde êş bibînim û bêbavî wek êşek ne tenê ji alîya maddî belkî di heman demê de menewî jî bû sebeba kêmasîyek mezin di jîyana min de. Min her zeman difikrîm ku pêwîste ez jî ji bo azadîya gelê xwe têkoşîn bikim. Mexabin hejmarek kesên kurd hebûn ku wê demê karê bawê min wek terror didîtin. Ez bi xwe li dijî kuştina însanan im. Lê gerek em wê yekê jî bidin berçawan kû wê demê de 1984-5 de dewleta îranê bi her awayî êrişê ser gelê me dikir û her roj bi bombeyan malan dişewtandin, kurdan dikuştin û tecawizê jinan dikirin. Gerek kurdan jî li Tehranê bersiv daban û şer li Kurdistanê berve welatê êrişkaran derbixînin. Ez karê wî ya kuştina pasdarên cenayetkar wek bersivek biçûk û li ser esasa parastina rewa dinirxînim.

_ Tu di rêxistina mafên mirovên kurdistanê de endamî, kengî ev rêxistin ava bûye û armancên wê çi ne?.

* rêxistina mafê mirovan a Rojhilatê Kurdistanê RMMK qasî 2 sale ku ava bûye. Ew yekemîn sazîya kurdan a medenî ye ku ji alîya hemî partiyên kurd

⟶

.